Serxwebûna Kosovo û daxwazên neteweya kurd

Cankurd

Berî her tiştekî pîroz be serxwebûna gelê Kosovo û her bijî bo wan qehremanên ku ji gef û gurên Uris û Sirbiyan netirsîne û serxwebûna welatê xwe dane xuyakirin û em bi hêvî ne ku teviya cîhanê vê pêngavê pîroz bike û Kosovo mîna dewleteke bi serê xwe bipejirîne.

Kosovo welatekî biçûk e, ne li ber zireyekê, an jî li ber oqyanûsekê de ye, ew li başûrê Ewropa ya rojhilat e, dora 10.877 km² pan û fireh e, gelê wî jî (2.126.708 Milyon mirov e) pir kêmtir e ji gelê rojavayê Kurdistanê, ku dibe du caran gelê wê ji yê Kosovo bêtir be.

Dewletên ku li çar rexên vî welatî evin: Sirbiya, Montênêgro (Çiyayê Reş), Albaniya û Mekdoniya. Li Kosovo li ciyê pereyên neteweyî Euro di kar de ye. Paytextê welêt bajêrê Prîştîna ye û sê ziman li Kosovo bi kar tên: Albanî, Sirbî û Ingilîzî. Roja 17.02.2008, serekê Wilayetên Yekbûyî yên Amerîka (USA) ev gava pêşkeftî pîroz kir û got: *"Ji niha û pê ve, Kosovo welatekî serbixwe ye."* Berê jî, hinek welatên wekî Luksemburg li Ewropa, Cîbutî li Afrîka, Kuweyt li Rojhilata navîn û Tîmorê rojhilatî li Asya jêrî. Firehbûna Luksemburgê 2586 km² e, kêmtirî 1 milyon nişţevanên wê hene, lê ji sala 1867ê de xwe ji peymana almanî azad û cihê kiriye. Cîbutî ne bêtir e ji ½ milyon mirov, firehbûna wê 23.200 km² e, û ji sala 1999 ve welatekî serbixwe ye, tevî ku ji 1000 zarokên wê ne kêmtir ji 6 ji ber birçîbûn, nexweşî û astengiyên civakî û aborî dimirin. Kuweyt 17.818 km² e, dora 3 milyon mirov e, lê ji sala 1961ê ve mîna dewletek serbixwe ye, û Tîmora rojhilatî tenha 33.850 km² e, dora 3 milyon mirovên wê hene, lê ew jî berî niha bi demekê gehişte serxwebûna xwe.

Gava em li rewşa neteweya

kurd binêrin, emê bibînin, ku welatê wan 'Kurdistan' li ba rojhilatnasan mîna dergoşa şaristaniyê' tê nasîn û pir ji zû ve, 16 wilayetên wê, hîn di dema xortbûn û bi hêzbûna emperetoriya Osmanî de, şêweyekî 'Xwedmuxtariyê' bi fermanek sultanî standi bûn. Ev Kurdistan li gor lêkolînên mamosteyê navdar rehmetî Hesen Hişyar ne kêmtir e ji 700.000 km², û ewên firehiya wê kêmtir didin xuyakirin, dikevin çewtî û şaşiyê. Ev welat ji 5 welatên Europî bi hev re firehtir e, û bi hejmara nişţevanên xwe mestirîn neteweya bê serxwebûn di cîhanê de ye. Paş têkçûna bizava "Xweybûn" di sala 1930 de, ji ber parçebûna xaka Kurdistanê di nav 4 dewletan de û di nav sê neteweyan de û ji dûrbûna wê ji zireyê ve, tevgera rizgariya neteweya kurd pilan û projeyên xwe di dema "Cenga Sar" de guhartin û ji daxwaza serxwebûnê daketin, bi Otonomî an jî hîn bi kêmtirîn daxwaz derketin holê. Lê ew dema pevçûna du sengerên leşkerî, yek Sosiyalîst û yek emperyalîst, çû serî û dibe jî ku tew carek dî venegere. Mixabin dîsa jî di binyada ramanî ya tevgera neteweyî ya kurdî de pir guhartin pêda nebûn. Raste ku niha li jêriya Kurdistanê tevgera me ji otonomiyê hilkişiya pileya federaliyê, lê di Kurdistanê de, bi piranî tevger hîn di nav kefteleftên "Cenga Sar" de maye... Eve jî dibe egera ku kêşeya neteweyî ya kurdî dengvedanek nêvneteweyî nastîne û berûvajî vê yekê, rêber û mezinên tevgera me daxwaza serxwebûna Kurdistanê mîna "xewnek şevan!" didin xuyakirin.

Di rewşek wilo de, paş ku Kosovo jî giha serxwebûna xwe, pir giring û pêwîst e ku hişmendên me carekê li xwe û li pilan û projeyên xwe yên ramyarî vegerin. Heger em ji neyarêd xwe ditirsin, divê em ji bîr nekin ku gelê Kosovo yê piçûk ji hevbendiya Sirbiyan û Rûsan netirsiya, tevî ku hêza wî pir ji ya gelê me nizimtir e, Tîmora rojhilatî jî her weha ji mezinahî û hêzdariya Endonisya netirsiya...

Hindek dibêjin, ku gava USA û Ewropa rê nedin, kesek nikane serxwebûna xwe bistîne. Eve ne rast e û divê berî her tiştekî em bi hev re bigehin biryarek wêrek û hevpar û dirist di vî warî de. Bêguman neteweya kurd di vê mijarê de bo hîn bêtir fedekarî û pişţevanî amedeye...